

Konferansa II'yemîn: 3-5 Nîsana 2015, Hamburg

Bername û nivîsar û vîdeoyên din li ser vê malperê bi dest dikevin: <http://networkaq.net>

Banga ji bo Konferansa sala 2015

Hevalên hêja,

Hûn bi konferansa me ya sala 2012, ku me li Hamburgê li dar xistibû, hesiyana yan tê de beşdar jî bûn. Sê rojan bi sedan xwendekar, rewşenbîr û çalakvan hatin cem hev û perspektîvên ji bo têkbirina modernîteya kapîtalîst a heyî, ku niha di nav qeyranekê de ye, gotûbêj kirin. Herweha fikr û ramanên Têkoşîna Azadîxwaz a Kurdî û hawîrdorên din ên li ser vê mijarê jî hatin nîqaş kirin.

Em niha bi kêfweşî konferansa xwe ya duyemîn a li jêrê ve serena sereke radigihînin. “Berxwedana li dij Modernîteya Kapîtalîst II: Teşrîhkirina Modernîteya Kapîtalîst – Avakirina Modernîteya Demokratîk”. Konferansa me di dawîya hefteya paskalyayê de, navbera 3-5'ê nîsana 2015'an de li bajarê Hamburgê yê Almaniyayê bi rê ve diçe. Di vê konferansa duyemîn de modernîteya kapîtalîst dê were nirxan lê jê girîngtir bala konferansê dê bêhtir li ser mijara avakirina alternatîfêkê be. Bi vî awayî aborîyeke nû û azadîya jinê dê bibin mijarên sereke yê konferansa 2015ê. Hêvîya me ew e, ku konferansa îsal ji ya berê ne tenê mezintir be lê herweha jê baştir jî be.

Pênc serena sereke yê konferansê:

- Teşrîhkirina Modernîteya Kapîtalîst
- Li hember Modernîteya Kapîtalîst, Modernîteya Demokratîk
- Li hember Endustrîyalîzmê, Endustrîya Ekolojîk û Aborîya Komunal
- Çareserkirina Astengiyên Teorîya Şoreşger
- Dersên ku ji Alternatîfên Pratîk tînin hîn bûn

Îsal ji bo “Call for papers” (bangawazî ji bo gotaran) dê pênc mijar hebin. Hûrgilîyên wan dê di nav çend rojên pêşîya me de werin eşkere kirin.

Agahiyên teknîkî:

Tarîx: 3-5 Nîsanê 2015, Saeta destpêkirinê: 14:00

Cih: Zanîngeha Hamburgê, Audimax

Wergar: Wergarên hevde mî yê kurdî, îngilîzî, almanî, tirkî; belkî îtalyanî yan spanî

Xwarin-Vexwarin: Ji bo beşdarên qeydkirî navroj: 3 Euro. Çay, qehve û av dê amade bin.

Weşana zindî ya Înternetê: Tevahîya konferansê dê li ser înternetê bi çendîn zimanan zindî were weşandin.

Çalakîyên çandî: Roja şemiyê êvarê çalakîyeke çandî dê hebe.

Mûçeya Navnivîsîyê: Ji bo xwendekar û bêkaran 10 Euro, jib o kesên din 20 Euro

Cihê mayîne: Serê kesekî mayîna di hostelekê pir-textî de 15 Euro, mayîna li malan bêmûçe.

Hûn dikarin ji niha de navê xwe bidin nivîsandin.

Tika ye xwe li ser malpera registration@networkaq.net qeyd bikin
û diyar bikin ka hûn dixwazin bişev li kê derê bimînin.

Network for an Alternative Quest: Însiyatîfa Navneteweyî ya “Ji bo Öcalan Azadî- Ji bo Kurdistanê Aştî” • KURD-AKAD – Tora Akademîsyenên Kurd • YXK – Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê • Kovara Kurdistan Report • ISKU - Informationsstelle Kurdistan e.V. • Cenî – Buroya Aştîyê ya Jinên Kurd • Civaka Azad-Kurdisches Zentrum für Öffentlichkeitsarbeit • Akademiya Zanîstên Civakî ya Mezopotamiya (Qamişlo) • SAMER – Navenda Lektîvîyên Siyasî û Civakî (Amed)